# WÊNESAZÎ

## NAVÎN 1



**2019/2020**

**AMADEKAR**

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Wênesaziyê ve hatiye amadekirin.**

**LÊVEGER**

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


BEŞA YEKEM........................................ 7

RENGÊN BÊLAYAN ........................................8

RENGÊN ZEYTÎ ........................................11

NEXŞÊN GEOMETRÎYÎ........................................15

XUYANG (1) ........................................18

XUYANG (2) ........................................22

DEMSALA ZIVISTANÊ ........................................25

PIFDANK ........................................27

DEVE (GEMIYA BIYABANÊ)........................................29

XEMILANDINA LÊNÛSÊ........................................32

NÎGARKIRINA RÛ (1) ........................................34

NÎGARKIRINA RÛ (2) ........................................39

BEŞA DUYEM........................................ 45

XEMILANDINA FINCANÊ ........................................46

PINPINÎK........................................50

RÛPOŞK........................................54

GÎTAR ........................................57

BÎR........................................62

BERIKEKE JI PELAN........................................66

BEŞA SÊYEM........................................ 71

BINGEHA HUNERÊ ........................................72

HUNERA DESTPÊKÎ ........................................74

SERDANA PÊŞANGEHEKE DIBISTANÎ ........................................76

# BEŞA YEKEM
# RENG Û WÊNESAZÎ

1. **RENGÊN BÊLAYAN**
2. **RENGÊN ZEYTÎ**
3. **NEXŞA GEOMETRÎYÎ**
4. **XUYANG (1)**
5. **XUYANG (2)**
6. **DEMSALA ZIVISTANÊ**
7. **PIFDANK**
8. **DEVE (GEMIYA BIYABANÊ)**
9. **XEMILANDINA LÊNÛSÊ**
10. **NÎGARKIRINA RÛ (1)**
11. **NÎGARKIRINA RÛ (2)**


**WANE 1**

# RENGÊN BÊLAYAN

## Armanca hunerî:

Naskirina xwendekar ji rengên bêlayan re û giringiya rengê spî û yê reş di guherîna taybetiyên rengan de.

**Xwezaya derdora me bi hêmanên xwe, gelek grûpên rengan dihewîne. Ew grûp jî ev in:**



**Grûpa rengên sereke:** rengê sor, zer û şîn e.

**Grûpa rengên dariştî:** rengê kesk, binefşî û pirteqalî ye.

**Grûpa rengên sar:** rengê şîn, kesk û binefşî ye.


**Grûpa rengên germ:** rengê sor, zer û pirteqalî ye.

**Her wiha grûpek din heye di girovera rengan de peyda nabe. Ew jî ev e:**

**Grûpa rengên bêlayan:** Rengê spî, reş û rengê xalîkî ye; ji ber ku ev reng ji tevlihevxistina rengê spî û reş, saz dibe. Her wiha ev reng bi navê rengên sî û ronahiyê tên bi navkirin. Ev her sê reng, hemû rengên din bi hêz û belî dikin.



**Em dikarin ji tevlihevxistina her sê rengên sereke jî rengê xalîkî, bi dest bixin:**




**Taybetiyên derbirînî yên rengên bêlayan:**

**Rengê spî:** Rengê ronahiyê ye û ev reng aram e, ji ber ku tenêtî û aramiyê nîşan dide. Bikaranîna rengê spî di valahiyê de, firehbûnê dide xuyakirin. Lê bikaranîna vî rengî bêyî zêdekirina rengekî din lê, sarbûn û tenêtiyê nîşan dide. Her wiha rengê spî rengekî bihêz e ji vajîbûna ronahiyê re; ji ber vê yekî gewde ji qebareya xwe ya rastqîn, mezintir xuya dibin.

**Rengê reş:** Rengê siyê ye. Ev reng tengbûn, tarîbûn, dilzarî û şînê dide xuyakirin. Rengê reş, ronahiyê dimije, ji ber vê yekê gewde ji qebareya xwe ya rasteqîn, biçûktir xuya dibin.

**Rengê xalîkî:** Bi zêdekirina rengê reş li rengê spî, ev reng saz dibe. Her wiha em dikarin ji tevlihevxistina her sê rengên sereke jî, bi dest bixin.



**Sedemên binavkirina van rengan bi navê rengên bêlayan:**

1. Di girovera rengan de peyda nabin.
2. Bi hemû grûpên rengan re hevseng dibin.
3. Di dema tevlihevxistina van rengan bi çi rengên din re, em pileyên zelal û tarî ji wan rengan, bi dest dixin.



## RAHÊNAN:

1. **Milkêşeke ku dirêjiyên her du durahiyên wê 10 cm û 30 cm bin, xêz bike û piştre li şeş parçeyên yeksan parve bike; ku tu tê de pileyên rengê xalîkî, diyar dikî.**
2. **Hewil bide ku tu bi pileyên rengê xalîkî, dîmeneke ku demsala zivistanê nişan dide, xêz bikî.**

**WANE 2**

# RENGÊN ZEYTÎ

## Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya naskirin û bikar-anîna rengên zeytî re.

## Rengên zeytî:

Macûnên ji boyaxên rengîn in. Tovê kitan bi rêjeyeke destnîşankirî di pêkhateya wan de heye. Ev macûn di qotîkan de tên hilandin.



## Amûrên pêwîst ji nîgarkirina bi rengên zeytî re:

**Firçeyên rengên zeytî:** Ev cureyê firçeyan heta astekê hişk in.



**Tabloya tevlihevxisteka rengan:** Li ser vê amûrê, reng tên lihevxistin.



**Rahişteka tabloyê:** Rahiştekeke depî ye, tablo li ser bi cih dibe.



**Neft:** Ji bo şûştina firçeyan piştî bikaranîna rengan, tê bikaranîn.


**Tirbentîn û zeyta kitan:** Ji bo ronkirina rengan tên bikaranîn.

**Bikaranîna rengên zeytî di vê tabloya li jêr de, hestekî aram dide me; mîna ku tablo zindî be.**



**Ta ku em tabloyekê bi rengên zeytî nîgar bikin, divê em van gavan bişopînin:**

1. Em ê xêzên destpêkê yên mijarê bi pênûsa risas û bi xêzên zelal û sivik, xêz bikin.
2. Em dikarin di destpêkê de awayê belavkirina rûberên rengîn li gor pile, ronahî û tarîbûna wan nîgar bikin, paşê em ê rûberan bi xêzan dabeş bikin.
3. Berî bidawîbûna nîgarkirinê, em dikarin li nîgarê vegerin û li gor armanca em dixwazin, nîgarê sererast bikin çi di zelalkirina tabloyê, tarîbûn û stûrkirina xêzan de be.



**"Şeveke Tijî Stêrk" tabloya Hunermend Vencent Willem Van Gogh (Vênsênt Wîliyem Van Gûx) e.**

**Em bi hev re nas bikin:**

**Vencent Willem Van Gogh, kî ye?**

Wênesazekî Holandî ye, di navbera (1890-1853) de jiyaye. Tabloyên wî li seranserî cîhanê, ji tabloyên herî binavûdeng û nirxbuha ne.

**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu nîgarkê bi rengên zeytî nîgar bikî. Di tabloyê de rengên sereke bi kar bîne, lê piştî bidawîbûna rengînkirinê, şûştina firçeyên xwe ji bîr neke.**

WANE 3

# NEXŞÊN GEOMETRÎYÎ

## Armanca hunerî:

Fêrkirina xwendekar çawaniya dîzayinkirina yekîneyên nexşên geometrîyî re.

## Nexşên geometrîyî:

Ew nexş e di bingeha xwe de, li gorî rêgez û bingehên geometrîyî û bîrkariyê ye ku pala xwe dide nîgarkirina gometrîyî. Ev nîgar û teşe girover, çargoşe, sêgoşe, pirgoşe, milkêş, teşeyên stêrkî û badokî ne, lê stêrka heştgoşeyî ya ku ji heşt goşeyan pêk tê, ji navdartirîn nexşên belav e ji nav nexşa geometrîyî de.


**Em di van her du teşeyan de dibînin ku çawa nexşên geometrîyî li ser kumbed û qafikan, hatine nîgarkirin.**






### Gavên nîgarkirina stêrka heştgoşeyî:


1. Em ê xêzikan di hundirê her du çargoşeyan de, xêz bikin û bighînin hev.




2. Em ê çargoşeyên di rêya xêzikan re diyarbûyî, tarî bikin, paşê em ê xêzên zêde jê bibin.



3. Em ê du stêrkên heştgoşeyî yên nû di hundirê teşe de, xêz bikin.



4. Em ê di hundirê her çargoşeykê ji çargoşeyên li derdora teşe, çargoşeyeke jê biçûktir xêz bikin. Di dawiyê de, em ê nexşê bi rengên guncaw rengîn bikin.

**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu li gor van xalan, nexşeke geometrîyî nîgar bikî:**

1. **Teşeyekî gometrîyî yê hêkî xêz bike.**
2. **Teşeyê hêkî bi awayê sîmertîk û dûbarekirinê, pêk bîne.**
3. **Nexşa xwe bi rengên avî, reng bike.**
4. **Li paqijiya xwe û karê xwe baldar be.**

**WANE 4**

# XUYANG (1)


## Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji naskirina dûrbûna sêyem, ji teşeyan re.

## Nîgarkirina xuyangî:

Teknîkeke nîgarkêşiyê ye ku dûrbûnê di rêya rûyê teqaliyî re, dide xuyakirin.

Gelek rêbaz hene ku dikevin di bin navê nîgarkirina xuyangî de, mîna: xuyanga ji yek xalê, xuyanga ji du xalan, xuyanga ji sê xalan û hwd.





## Xêzkirina kabeke xuyangî:

**Nerîna kabekê di rewşên wî yên cuda ji van her sê astên çav re, bi hevalên xwe re parve bike:**


1. Ji asta çav bilindtir.
2. Di asta çav de.
3. Di bin asta çav de.

**Em ê kabekê di bin asta çav ji aliyê çepê ve, li gor gavan, nîgar bikin:**


1. Em ê xêza asta çav û xala sereke xêz bikin.




2. Em ê rûyê pêşîn ê kabê xêz bikin.




3. Em ê xêzên belavbûyî, xêzên asoyî û yên stûnî xêz bikin.



4. Nîgarkirina kabê bi xuyanga pêşîn, her wiha xêzkirina siya kabê.



Di dawiyê de, em ê xêzên belavbûyî jê bibin, kabê rengîn bikin û siyê bi rengê guncaw rengîn bikin.



**RAHÊNAN:**


**Hewil bide ku tu li gor rêgezên nîgarkirina xuyangê, kabekê bi her sê rewşên cuda ji çavên bîner re, xêz bikî û paşê wan bi rengên guncaw rengîn bikî.**

**WANE 5**


# XUYANG (2)

Xuyang di her tiştên em di jiyana xwe ya rojane de dibînin, heye. Di rêya xuyangê re, dûrbûn, nêzîkbûn û qebareya gewdeyan ji me re diyar dibe. Di vê waneyê de, em ê xuyanga çargoşe a hevderbaskirî nas bikin.


1. Em ê xêza asta çavên bîner û xêzên belavbûyî, xêz bikin.




2. Em ê çargoşeyên asoyî di rêya xuyanga pêşîn re, xêz bikin.




**3.** Em ê xêzkirina çargoşeyan berdewam bikin.



**4.** Piştî bidawîbûna xêzkirina çargoşeyan, em ê bi rengên hevseng û guncaw, çargoşeyan rengîn bikin.



5. Em ê rengînkirinê berdewam bikin, heta em vî teşeyî bi dest bixin.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu çarçoveya wêneyekî li gor rêgezên nîgarkirina xuyangê, nîgar bikî û paşê bi rengên ku tu hez dikî rengîn bikî, lê paqijiya karê xwe ji bîr neke.**

**WANE 6**

# DEMSALA ZIVISTANÊ

## Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji bikaranîna rengên sar û yên germ di amadekirina karên hunerî de.

Li nîgara li jêr binêre, hewil bide ku tu di rêya dîtina hêmanan, belavbûna wan, bikaranîna sî û ronahiyê û rengên sar û yên germ tê de, mijûl bibî. Her wiha derbirînkirina nîgerkêş ji gewdeyên dûr û nêzîk re, bixwînî.



## Em bi hev re bi bîra xwe bînin ku:

**Grûpa rengên germ:** sor, zer û pirteqalî ye.

**Grûpa rengên sar:** şîn, kesk û binefşî ye.

**Ji bo pêkanîna karekî rast, pêwîst e em van gavan bişopînin:**

1. Em ê hêmanên ku demsala zivistanê derbirîn dikin, di aşopa xwe de destnîşan bikin.
2. Em ê wan hêmanan li ser lênûsa wênesaziyê raxin, gewdeyên nêzîk û dûr di ber çavan re derbas bikin û bi pênûsa risas xêzên sereke bi zelalî, xêz bikin.
3. Em ê bi rengên avî yan ên zeytî rengîn bikin, lê divê em peywendiyên rengan û pileyên wan her wiha sî û ronahiyê di gewdekirina hêmanan de, di ber çavan re derbas bikin.
4. Divê em guh bidin paqijiya xwe û karê xwe, her wiha derhêneriya hunerî jî.



## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu dîmenkê ji demsala zivistanê nîgar bikî ku tê de tevgera mirovan û xwezayê baş derbirîn bikî. Her wiha rengên sar û yên germ tê de bi cih bike û paşê pola xwe bi tabloya xwe bixemilîne.**

**WANE 7**

# PIFDANK

## Armanca hunerî:

Di karê hunerî de, geşedana karîna xwendekar di bikaranîna rengên sereke û yên darıştî.

## Pifdank:

Pimpimokeke mezin e û bi binê wê ve zembîlek heye. Ev zembîl ji bo çûn û hatina mirovan, her wiha ji bo veguhestina pertalan re bi kar tê. Taybetiya pivdankê vedgere xweşikbûna rengên wê, nexasim gava li ezmana difire.

**Balê bikşîne li ser teşeyê pivdankê û çawaniya belavkirina rengan, li ser pempemoka wê.**



**Ji bo ku em pivdankekê nîgar bikin, pêwîst e em van gavan bişopînin:**

1. Em ê teşeyê pivdanka ku em dixwazin nîgar bikin, di aşopa xwe de destnişan bikin.
2. Em ê pivdankê bi pênûsa risas, bi xêzên sivik û zelal xêz bikin, lê divê em nêzîkbûn, dûrbûn û qebareya gewdeyan, di ber çavan re derbas bikin.
3. Divê em guh bidin derhêneriya hunerî û paqijiya karê xwe.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu pivdankekê bi rengên hevbelîker (sar û germ) nîgar bikî û nêzîkbûn û dûrbûna gewdeyan di ber çav re derbas bikî.**

**WANE 8**

# DEVE (GEMIYA BIYABANÊ)

**Armanca hunerî:**

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya nîgarkirina deve re.

**Deve:**

Di demê berê de, deve ji bo çûn, hatin û veguhestina pertalan, dihat bikaranîn, ji ber vê sedemê, bi navê gemiya biyabanê hat binavkirin.


**Hûrguliyên gewdeyê deve baş bibîne:**




**Ji bo ku em nîgarkirina deve pêk bînin, divê em van gavan bişopînin:**

1. Em ê hêmanên ku em dixwazin pê mijarê derbirîn bikin, em ê di aşopa xwe de, destnîşan bikin.
2. Em ê hêmanên destnîşankirî, bi pênûsa risas, bi xêzên sivik û zelal xêz bikin.
3. Em ê hêmanan bi hevsengî belav bikin.
4. Em nêzîkbûn û dûrbûna gewdeyan, di ber çavan re derbas bikin.
5. Rengînkirina bi rengên guncaw, her wiha em peywendiyên rengan bi hev re, di ber çavan re derbas bikin.

**Heta ku em deveyekî nîgar bikin, pêwîstiya me bi şopandina van gavan heye:**





5

## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu deveyekî li biyabanê xêz bikî, paşê bi rengên guncaw rengîn bike.**


**WANE 9**

# XEMILANDINA LÊNÛSÊ

## Armanca hunerî:

Firehkirina aşopa xwendekar di warê afirandina xemilandinê de, ji bo pelên lênûsê.

Xemilandina lênûsê ji aliyê hundir ve, bandoreke xwe li ser derûniya mirov heye, ji ber ku bi dîtina çavan ji reng û xemilê re, derûniya wî aram dibe.





## Heta ku em lênûsa xwe bixemilînin, gerek e em van gavan bişopînin:

1. Em ê ramana xemla ku em dixwazin dîzayin bikin û di aşopa xwe de destnîşan bikin.
2. Em ê wê ramanê bi pênûsa risas û xêzên zelal û sivik, li ser pela lênûsê xêz bikin.
3. Em ê hewil bidin ku em dîzayineke nû biafirînin û dûrî lasakirin û jêgirtinê bikevin.
4. Eger pêwîst bibe, em ê amûrên geometrîyî bi kar bînin.

5. Em ê di dîzayina xwe de, hêmanan bi şêweyekî hevseng û guncaw, belav bikin.
6. Em ê bi rengên guncaw û lihevhatî, rengîn bikin.
7. Em ê li paqijiya karê xwe, baldar bin.





## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu di xemilandina pelên lênûsa xwe de, xemileke nû bi hûrbînî biafirînî û paşê bi rengên guncaw, rengîn bike.**

**WANE 10**


# NÎGARKIRINA RÛ (1)

## Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya nîgarkirina mirûzên rû li gor rêgez û bingehan.

Ji hêsantirîn awayên nîgarkirina rû, ew e ku em giroverekê xêz bikin û piştre em rû dabeşî xêzan bikin (bi dirêjkî û panayî). Ev xêz dê cihên mirûzan destnîşan bikin (çav, bêvil, guh û dev). Her wiha dirêjahî û panayiya rû, destnîşan dike.

Di diyarkirina mirûzên teşe de, sîkirin pir giring e. Cihên bilind zelal in, ji ber ku ronahî lê dixe, mîna: Jora bêvilê, her du gurmik, keviyên guhan ên pêşberî jêdera ronahiyê û por bi pêlên xwe.



**Heta ku em rûyê jinekê nîgar bikin, pêwîst e em van gavan bişopînin:**


1. **Em ê çarçoveya derveyî ya rû, xêz bikin:** Seriyên girover tune ne; teşeyê serî hêkî ye. Ji ber vê yekê, divê em çarçoveya rû, hêkî xêz bikin ku ji binî ve ziravbûna wê, zêdetir be.



2. **Em ê xêzên dabeşkirinê û bêvilê nîgar bikin:** Em ê xêzeke stûnî di nîvê serî de ji jor ve heta binî, xêz bikin. Her wiha em ê xêzeke asoyî di nîvê serî de bi panayî xêz bikin. Paşê em ê xêzeke din jî di bin re xêz bikin û di navbera xêza asoyî û panayî, de em ê bêvilê destnîşan bikin.




3. **Xêzkirina dev:** Em ê çariya binî ji rû, bi xêzeke sêyem bi panayî, dabeşî du beşan bikin. Ji ber ku di nîgarkirina lêvan de, lêva binî, pala xwe dide xêza panayî ya sêyem.




4. **Xêzkirina kortka çavan:** Em ê du giroveran li ser xêza panayî ya ku navendê qut dike, xêz bikin ku kortên çavan saz bikin.




5. **Xêzkirina birû û çavan:** Em ê birûyan jî li jora giroverên çav destnîşan bikin. Her wiha em ê tşeyê çavan ên ku dişibin liba behîvê, xêz bikin. Lê em ji bîr nekin ku teşeyê çavên her mirovekî, ji yê din cudatir e.






6. **Xêzkirina guhan:** Em ê guhan di heman asta bingeha bêvilê de, xêz bikin.



7. **Xêzkirina qirik û por:** Em ê ji du xêzên dirêjkî yên pêldayî ji aliyê derve ve, xêz bikin. Her wiha em ê porê jinê li gor teşeyê serê wê, bi awayekî guncaw, xêz bikin.



8. Di dawiyê de em ê xêzên destpêkê yên ku me pê rû dabeş kirbû, jê bibin.





## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu li gorî gavên bûrî, rûyê jinekê nîgar bikî, lê baş guh bide paqijî û hûrbîniyên karê xwe.**

**WANE 11**


# NÎGARKIRINA RÛ (2)

Hin cudahî di navbera teşeyê rûyê jinê û yê mêr de hene. Di vê waneyê de, em ê çawaniya nîgarkirina teşeyê rûyê mêr li gor gavan nas bikin:


1. Em ê giroverkê bi xêzên zelal û sivik, xêz bikin.




2. Em ê xêzekê ji jora giroverê heta binî bikşînin, heta derkeve derveyî teşeyê giroverê.



3. Em ê vî teşeyî ji jêra giroverê ve xêz bikin; heta ku çena mêr saz bibe.



4. Em ê xêzeke asoyî bi teşeyê pêldayî xêz bikin, heta ku qebareya çav diyar bibe. Her wiha em ê xêzên destîşankirina dirêjahiya bêvilê, qebarya dev û guhan xêz bikin.



5. Em ê teşeyê çav, bêvil, guh, dev û birûyan, xêz bikin.



6. Em ê por û qirikê, xêz bikin.



7. Em ê hûrbîniyên biçûk ên rû, xêz bikin.




8. Em ê xêzên destpêkê yên ku me pê rû dabeş kiribû, jê bibin.



**9.** Em ê nîgarê bi rengên guncaw, rengîn bikin.



**10.** Em ê cihên sî û ronahiyê yê rû, baş nas bikin; heta ku em cihên siyê tarî bikin û cihên ronahiyê zelal bikin. Bi vê awayî nîgara me diqede.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu li gor van gavên bi me re derbasbûyî, rûyê mêrekî nîgar bikî, lê di sîkirin û ronahîkirina rû de, baş baldar be.**

# BEŞA DUYEM

# KARÊ DESTAN

1. XEMILANDINA FINCANÊ
2. PINPINÎK
3. RÛPOŞK
4. GÎTAR
5. BÎR
6. BEREKE JI PELAN

**WANE 1**

# XEMILANDINA FINCANÊ

## Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya xemilandina fincanan re, bi awayekî hunerî.

Em dikarin fincanên qehweyê û binikên wan bi hesanî têxin teşeyekî huerî. Di vê waneyê de em ê fêrî çêkirina wê bibin.



**Amûrên pêwîst:**

Fincaneke qehweyê û binikê wê, çetel, gulên çêkirî, demançeya şîrêzê û morîk ji bo xemilandinê.



**Heta ku em xemilekê ji fincanan çêkin, pêwîst e em van gavan bişopînin:**

1. Em ê çetelê bi alîkariya şîrêzê, bi binikê fincanê ve bikin.



**2.** Em ê serê çetelê bitewînin û fincanê pê ve asê bikin.



**3.** Em ê gulan bi vî awayî, li fincan û binikê wê, bi cî bikin.



4. Em ê pêvekirina gulan berdewam bikin û fincanê bi morîkan bixemilînin, heta em vî teşeyî bi dest bixin. Bi vî awayî ev karê hunerî yê xweşik, saz dibe.



## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu bi şopandina gavên bûrî, xemilekê ji fincanan bi reng û gulên tu hez dikî, saz bikî û paşê pê odeya xwe bixemilîne.**

**WANE 2**

# PINPINÎK

## Armanca hunerî:

Geşedana karîna xwendekar ji çawaniya çêkirina gewdeyan, ji heyberên cuda.


Em dikarin sûdê ji parçeyên caw bigirin û pê wan pinpinîkekê çêkin. Ne tenê ji caw, lê belê ji terîşên satan û silovanê jî pinpinîkan çêdibin.





**Armanca hunerî:**

Parçeyekî caw (sor), cawbir, ta û têl.



**Heta ku em pinpinîkekê çêkin, divê em van gavan bişopînin:**


1. Em ê ji têlê van her du teşeyan çêkin.



2. Em bi caw, têlan binuximînin û ji nîvî ve, girê bidin.



3. Em ê nixumandina têlan bi vî awayî, berdewam bikin.



4. Em ê her du basikan li hev siwar bikin û bi ta, bi hev ve girê bidin.



5. Em ê gewdeyê pinpinîkê bi alîkariya têl, caw û ta çêkin. Her wiha em ê qiloçên pêhesînê ji têlan saz bikin.



6. Em ê baskan bi gewde ve bikin. Bi vî awayî pinpinîka me amade dibe.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu li gor gavên bûrî, pinpinîkekê bi rengê tu hez dikî saz bikî û paşê pê ode û pola xwe, bixemilîne.**

**WANE 3**

# RÛPOŞK

## Armanca hunerî:

Fêrkirina xwendekar çawaniya çêkirina rûpoşkan, ji heyberên cuda.

Çêkirina rûpoşkan yek ji arazû û çalakiyên bicoş e ku em dikarina wan li mal û dibistanê pêk bînin. Her wiha li dibistanê di mînandina kesayet û lawiran de; ji bo nasîna reftar, teşe û taybetiyên wan, tên bikaranîn





### Amûrên pêwîst:

Peleke çirsok (kesk), karton, terîşek ji bo xemilandinê, cawbir û demançeya şîrêzê.



### Heta ku em rûpoşkekê çêkin, pêwîstiya me bi şopandina van gavan heye:

1. Em ê teşeyê ku em dixwazin çêkin, li ser kartonê xêz bikin, piştre em ê pela çirsok li gor wî teşeyî xêz bikin û bibirin. Paşê em ê bi kartonê ve bikin.



2. Em ê her du kunên çavan bi teşeyê behîvê, vekin.



3. Em ê terîşa xemilandinê bi teşe ve bikin. Her wiha em ê lastîkekê pê ve bikin; ji bo ku em karbin li xwe bikin. Bi vî awayî rûpoşkê me amade dibe.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu rûpoşkekî bi rengê tu dixwazî, çêbikî û paşê bi xemila tu dixwazî bixemilîne.**

WANE 4

# GÎTAR

## Armanca hunerî:

Geşedana afrîneriya xwendekar di çêkirina gîtareke kartonî de.

## Gîtar:

Amûreke muzîkê ya têlî ye, bi tiliyan tê lêdan. Dibe ku bi tekanî bê bikaranîn û dibe ku bi koma muzîkî (orkêstra) re be jî.



## amûrên pêwîst:

Kartoneke stûr, lastîk ji bo têlan, burxî, kolac, cawbir û şîrêz.



**Heta ku em karibin gîtarekê çêkin, pêwîstiya me bi şopandina van gavan heye:**

1. Em ê teşeyê gîtarê li ser du kartonan xêz bikin, bibirin û piştre em ê wan bi hev ve bikin.



2. Em ê kolacê li gor teşeyê kartonê bibirin.



**3.** Em ê kolacê bi kartonê ve bikin.



**4.** Em ê rûyê din jî ji kartonê bi kulacê binixumînin.



5. Em ê du parçeyên kartonê ji bo bicîkirina têlan bi gewde ve bikin.



6. Em ê burxiyan di ber her du parçeyên kartonan ku ji bo têlan e, bi cî bikin.



7. Di dawiyê de, em ê lastîkan bi burxiyan ve bijdînin, heta ku bibin têlên gîtarê. Bi vî awayî gîtara me bi dawî dibe.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu bi alîkariya gavên bûrî, gîtarekê bi rengê tu dixwazî, çêbikî, lê paqijiya xwe û karê xwe ji bîr neke.**

**WANE 5**

# BÎR

## Armanca hunerî:

Bipêşxistina karîna xwendekar di qezenckirin û sûdgirtina ji heyberên cuda di çêkirina gewdeyên biçûk de.

**Bîr:** Ew kuna di erdê de ye ku em avê jê bi dest dixin.







**Amûrên pêwîst:**

Karton, rengên avî, firçeya rengan, pelên qelayê, sê şaxên daran, fincaneke qehwî ya bilastîkî, demançeya şîrêzê û şaxine çêkirî ji bo xemlandinê.



**Heta ku em bîrekê çêkin, pêwîst e em van gavan bişopînin:**

1. Em ê kartonê li hev bizîvrînin û keviyên wê bi hev ve bikin û paşê em ê bi awayekî nebirêkûpêk rengîn bikin.



2. Em ê kartonekê bi teşeyê girover bi biniya bîrê ve bikin. Şaxên darikan bi vî awayî bi cî bikin û em ê pelên qelayê derbasî hundirê bîrê bikin.



3. Em ê fincana bilastîkî bi şaxê jor ve bi cî bikin û pelên qelayê derbasî wê bikin û paşê em ê wan pelan bi rengên avî (şîn) rengîn bikin.



4. Em ê şaxên bilastîkî li dora bîrê ji bo xemilandinê, bi cî bikin.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu di rêya gavên bûrî re, bîrekê bi taşe û heyberên tu hez dikî, çêbikî. Paşê di pêşangeha dibistanê de, pêşkêş bike.**


**WANE 6**


# BERIKEKE JI PELAN

## Armanca hunerî:

Bipêşxistina arazûya xwendekar di ware bikaranîna pelên rengîn di çêkirina berikan de.

Lîsteya karên destan pir berfireh e û gelek cureyan dihewîne. Yek ji wan çêkirina berikan e. Di vê waneyê de, em ê fêrî çêkirina berikên ji pelan bibin.





## Amûrên pêwîst:

Pelên rengîn, pênûsa risas, jêbir, rastkêş û cawbir.




## Heta ku em berikekê ji pelan çêkin, divê em van gavan bişopînin:


1. Em ê li ser pişta pela zer xêzan bi vî awayî xêz bikin. Her wiha pelên qehweyî bi teşeyê milkêşan bibirin.




2. Em ê wan xêzan li ser pela zer bibirin, ku navbera wan vala bimîne û paşê em ê milkêşan derbasî wan valahiyan bikin.



3. Em ê derbaskirina milkêşan bi heman awayî, berdewam bikin.



4. Di dawiyê de, em vê berikê bi dest dixin.



**RAHÊNAN:**

**Hewil bide ku tu bi alîkariya gavên bûrî, berikeke biçûk bi rengên tu jê hez dikî, çêbikî.**

# BEŞA SÊYEM

# ÇANDA HUNERÎ

1. BINGEHA HUNERÊ
2. HUNERA DESTPÊKÎ
3. SERLÊDANA PÊŞANGEHEKE DIBISTANÎ

**WANE 1**


# BINGEHA HUNERÊ

## Armanca hunerî:

Nasîna xwendekar ji çawaniya çêbûna hunerê û zêdekirina çanda hunerî li gel wî.

Ji hezarên salan ve, mirovan berhemên hunerî di rêya şûnwaran re, vedîtine.

Civaka destpêkê di warê hunerî de, ew pêşketî bû. Çi bi peyker, xemil û nexşên li ser bivir û kêran, tablo û deqên ku laşê wan dixemilandin, li gel wan hebûn. Ev hemû jêdera hunerê ne ku bi hestê xweşikbûnê re, li gel mirov derketine.



**Şûnwara Xerabreşkê li bakurê Kurdistanê.**

## Derketina hunerê:

Huner bi encama pêşketina mirêsa(ihtîşam) mirovan, derketiye. Reng ne ji bo pêkanîna wêneyan dihat bikaranîn, lê belê ji bo ku çavan şa bike. Bi xemilên ji xêzên pêldayî, dubarekirî, rast û yên rstênlihev dest pê kir. Paşê mirov hewil da hebûna lawirên li derdora xwe bi nexişkirin, peykersazî û

paşê bi nîgarkêşiyê bidin xuyakirin, êdî gihaştin nîgarkirina rûyê mirovan û nîgarkirina şînatiyê, lê bi rengekî destpêkî.



## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu li jêderine din li pirtûkxaneya dibistanê yan jî li navenda çand û hunerê, vegerî ji bo ku tu lêkolîneke li ser bingeha hunerê bikî û paşê wêneyên guncaw lê zêde bikî.**

WANE 2


# HUNERA DESTPÊKÎ

## Armanca hunerî:

Geşedanaa aşopa xwendekar di nasîna hunera destpêkî de.

Hunera destpêkî ji hêla xweşikbûnê ve hunerereke li pêş e ku zikmakiya mirovê destpêkî ev huner derxistiye; ji ber ku hemû pêdiviyên wî peydakirina cil û berg, xwarin, vexwarin û zêdekirin bû, dest bi peykersaziya keviran kirin, heta ku bi wan karibe jiyana xwe berdewam bike ango pê xwe biparêze û nêçîrvaniyê bike. Lewma di peykersazkirina kevir, dep û hestayan de pir jêhatî bûn.

**Şikefta Tamêra li Spaniyayê ji yekemîn şikeftên ku nîgarên destpêkî li ser hatine dîtin.**



## Hunera destpêkî li ku dihat nîgarkirin?

Hunera destpêkî li deverên ku mirov bi zehmetî dighêje wan, nîgar dikir. Ev yek jî vedigere ku baweriya mirovê destpêkî ji hunerê re ew bû ku huner ji bo başiya wî ye; lewma hunermend ji hêza xwezayê a veşartî ditirsiya. Êdî xwest di rêya nîgarên xwe re bi ser hêza xwezayê bikeve û zora wê bibe. Mirovê destpêkî dîmena xwe di dema nêçîrkirina lawiran de

nîgar kiriye; ji bo ku karibe di pêşerojê de nêçîrvaniya wan bike û bi wan karibe wek çawa di nîgaran de bi wan dikare, nîgar dikir. Her wiha xwe bi rûpoşkan jî nîgar kiribû, heta ku xwe ji efsûneyê bibarêze û lê bandor neke. Lewma li cihên bi zehmetî mirov dighêje wan, nîgar dikir heta ku ew nîgar bi hêza xwa ya efsûneyî bimînin.

## Hunermendên destpêkî çawa nîgarên xwe reng dikirin?

Hunermendên destpêkî reng ji xwezayê dibirin mîna ji xwînê rengê sor û ji komirê rengê reş çêkir. Lewma her tişt ji xwezayê bir û jê reng çêkir heta ku nîgarên xwe di teşeyekî rasteqînî de, çêke. Ji bo mayîna rengan heta demeke dirêj li ser şikeft û dîwaran, donê lawiran li rengên xwe zêde dikir. Lewma ew nîgaran heta niha di reng û teşeyê xwe de mane.



## Nîgarên hunermendên destpêkî çawa bûn?

Nîgarên hunermendê destpêkî hêsan bûn; hunrguliyên ku derbirîna teşe dikirin, nîgar dikir. Cihên dûr û nizim di gewdeyê lawir de, bi rengê tarî û cihên nêzîk û bilind, bi rengê zelal bûn. Heta ku di rêya sî û ronahiyê re, hestê gewdekirinê diyar bibe. Bi vê yekê hewil dida bi van nîgaran bighêje rasteqînê.

## RAHÊNAN:

**Hewil bide ku tu li jêderên cuda vegerî û jê agahî û wêneyên hunera destpêkî bi dest bixî û li ser lênûsa xwe binvîsî.**

WANE 3

# SERDANA PÊŞANGEHEKE DIBISTANÎ

## Armanca hunerî:

Geşedana asta mirêsiyê li gel xwendekar.

## Pêşangehên dibistanî:

Ew cihê ku komeçalakiyên ku xwendekar pê rabûne, dihewîne. Armanca vê yekê ew e ku asta afirînerya xwendekar û behreyên wî bê nasîn û bilindkirin. Lewma pêşangeh weke jêdereke giring e ji bo nirxandina karê hunerî yê perwerdeyî û sedemeke sereke ji bo zengînkirin û xweşikbûna dibistanê ye.





## Rêgezên serdana pêşangehê:

1. Em bi aramî bilivin û dûrbûnekê di navbera xwe û karên hunerî de bihêlin.
2. Li gor waneyên bûrî, em ê hewil bidin ku em karê hunerî bixwînin.
3. Rêzgirtina karên hunerî, lewma em destê xwe nadin wan.

**4.** Di dema gotûbêjkirina karên hunerî de, em ê bi dengekî nizim bi hevalên xwe re biaxivin.





**RAHÊNAN:**

**Têbîniyên xwe derbarê pêşangeheke dibistanî ku te ser lê daye binvîse. Her wiha sedema hezkirina xwe ji karê hunerî yê te dîtî, şîrove bike.**

# Belavkirina Waneyan Li Ser Sala Xwendinê

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
| --- | --- | --- | --- | --- |
| Rezber | | | **Rengên Bêlayan** | **Rengên Zeytî** |
| Cotmeh | **Xemilandina Fincanê** | **Nexşên Geometrîyî** | **Nexşên Geometrîyî** | **Pinpinîk** |
| Mijdar | **Xuyang (1)** | **Xuyang (2)** | **Rûpoşk** | **Demsala Zivistanê** |
| Berfanbar | **Demsala Zivistanê** | **Gîtar** | **Pifdank** | **Deve (Gemiya Biyabanê)** |
| Rêbendan | Lêveger | Lêveger | Bêhinvedan | Bêhinvedan |
| Reşemeh | **Bîr** | **Bîr** | **Xemilan-dina Lênûsê** | **Xemilan-dina Lênûsê** |
| Avdar | **Berikeke Ji Pelan** | **Nîgarkirina Rû (1)** | **Nîgarkiri-na Rû (20** | **Mijareke Serbst** |
| Cotan | **Jêdera Hunerê** | **Hunera Destpêkî** | **Serdana Pêşangehek e Dibistanî** | **Mijareke Serbest** |
| Gulan | Lêveger | Lêveger | | |